Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

Tebax / 15 - 8 - 2021 Kurdistan-Hejmar (203) www.pdk-s.com

# Divê welatî xwe biparêzin, vaksînê jî werbigrin

Kurdistan Îmad Omer



Ev demeke carake din li bajarên Kurdistana Sûriyê pêketiyên korona zêde dibe, û ev yek jî metirsî ye li ser rewşa tenduristî, ev yek di demekê de ye ku hejmara vaksînê li Kurdistana Sûriyê kêm e.

Li ser vê mijarê rojnameya Kurdistan nerîna welatiyan li ser vê mijarê wergirt.

Welatiyê bi navê Ehmed wiha li ser vê mijarê dibêje, corê Dêlta gelekî dijwar e, divê xelk xwe biparêzin, û xwe ji qerebaliziyê dûr bixin bi taybet pîr û kal, em dibînin ku çi li welatên dunyayê diqewimin.

Viyan jî wiha dibêje, rêjeyek ji vaksînê li Kurdistana Sûriyê heye çi di destê rêveberiya PYDê de çi ewên di jêr destê damûdezgehên rejîma Sûriyê, lê divê welatî sûdê ji vê yekê bibînin û vaksînê werbigrin û xwe jê netirsînin.

# Revandina zarokan û çekdarkirina wan li Kurdistana Sûriyê berdewam e

**Kurdistan- Îman Xelef**

**Di dema dawî de, ciwanên şoreşger ku ser bi PYDê ve ne zarokek 13 salî revandibûn ku navê wê Sîmav Osman û piştî 24 demjimêran ew vegerandibûn. Sîmav 13 salî ye û îsal pola xwendinê ya heştan qedandiye û dema diçû xuleke havînan a amadekirina ji pola nehan re, ji aliyê grûpa Ciwanên Şoreşger ve hatibû revandin. Tevgera Ciwanên Şoreşger ser bi PYD ve ye û pêştir çendîn caran ciwanên Kurd revandibûn û biçek kiribûn. Kiryarên vê tevgerê jî rastî gelek nerazîbûna xelkê Kurdistana Sûriyê. Berya niha Di raporta salane ya Wezareta Derve ya Amerîkayê de hatiye diyarkirin ku Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) zarokan dike çekdar û bi zorê wan tevî refên xwe dike û wan dişîne deverên şer. Wezareta Derve ya Amerîkayê di raporta xwe de eşkere kiriye ku PKKê li Şingalê bi sedan zarok kirine çekdar û bûne endamên Yekîneyên Berxwedana Şingalê (YBŞ), ku grûpeke ser bi PKKê ye û wan zarokan ji bo şer dişînin Tirkiye û çiyayê Qendîlê.Di beşeke din a raportê de hatiye gotin: "YPG ku grûpeke ser bi PKK ye, çekdarkirina kur û keçan didomîne, ku temenê hinek ji wan tenê 12 salî ye. Ji aliyê xwe ve, berya niha Neteweyên Yekgirtî da xuyakirin, sala par di pevçûnên cuda yên li cîhanê de zêdetirî 8500 zarok hatine biçekkirin û di van pevçûnan de nêzî 2700 zarok hatine kuştin. Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekgirtî Antonio Guterres raporta salane ya "Zarok û Pevçûnên Çekdarî" arasteyî Encûmena Asayişa Navdewetî kir û tê de behsa kuştin û birîndarkirina zarokan, destdirêjiya cinsî li ser zarokan, binçavkirin an leşkerkirina wan, rêgirtina li gihîştina alîkariyan û armanckirina dibistan û nexweşxaneyan hate kirin. Di raporê de hat, binpêkirin di 21 şer û pevçûnan de li dijî 19379 zarokan hatine kirin ku piraniya wan di sala 2020'an de li Somal, Kongo, Efganîstan, Sûriye û Yemenê pêk hatine. Di raporê de her wiha tê gotin, sala borî 8521 zarok hatine biçekkirin, 2674 zarok di şerên cuda de hatine kuştin û 5748 zarok jî birîndar bûne .Herwiha di raporê de lîsteyeke reş jî heye, armanckirin jê ew e "lîsteya şermê" ji aliyên şer û pevçûnan re hebe, bi hêviya ku wan han bidin tedbîrên parastina zarokan bi cih bînin. Çend cara rêxistina Human Rights Watch hişarî daye hêzên ser bi Partiya Yekîtiya Demokratîk PYDê ve ku eçkdarakirina zarokan rawestîne, lê ew hêj li ser van kiryarên xwe berdewam e.**

**Mîlad Îso wisa li ser vê mijarê dibêje, di rêya ciwanên şoreşger Partiya Karkerên Kurdistanê PKK van zarokan ji rê dibe û wan çekdar dike, herwiha wan perwerde dike heta ku tevlî refên wan bibe û wan ji bo şandina Qendîlê amade dike, ev yek ji hemû xelkê re diyar û eşkere ye û divê ti aliyek derbarê vê pirsgirêka mezin bêdeng nebe, heta ku zêdetir keç û kurên xelkê nerevînin û tevlî şerê xwe yê bidawî neke, ev rêxistin zarokan bi xwe ve girê dide heta ku ehta dawiyê ligel wan bimîne, ev siyaseta van rêxistinan e. Li devera me bi sedam jin, zarok revandine û tevlî refên xwe kirine û bi taybey zarokên temenên wan biçûke, û heger malbat li wan bipirse jî nabêjin ew li çi deverê ne. Wan vedşêrin, heger ew zarok poşman jî bibin çê nabe vegerin.**

**Fîras Xelef ew jî li ser vê mijarê wiha dibêje, ev rêxistin mala Kurdên her çar perşeyên Kurdistanê xerab kiriye, kiryarên wê bûne asteng li pêş wan, bi rsatî divê çareseriyek ji vê pirsgirêkê re were dîtin, revandina zarokên xelkê karesateke mezin û divê hemû ew zarok ji bo malbatên wan werin vegerin, ev siyaset ya dijminan e, ew dixwazin di rêya vê partî re zarokên me bê xwendin û zanîn bikin.**

**Salar ku berya niha ev pirsgirê bi ser wî re derbas bûye, wiha dibêje, Ciwanên bi navê şoreşger ku ser bi PYDê ve ne mejiyê zarokan dişon, û dihêlin ku dev ji xwendinê berdin, û xwendina xwe temam nekin û tevlî hizra leşkerî binin, û ev yek wek destpêkekê ye ji bo rakêşana wan ji bo karê leşkerî. PYD û çekdarên xwe bi pilan van karan dikin û karên wna ji berjewendiya Partiya Karkerên Kurdistanê PKKê ye.**









# Vegera xelkê Efrînê baştirîn çareseriye ji bo rêgirtin li Erebkirinê

**Bajarê Efrînê yê Kurdistana Sûriyê di 20 Çileya 2018an de rastî êrîşa artêşa Tirkiyê û grûpên çekdar ên ser bi wê ve hat û piştî şerê 58 rojan, Efrîn roja 18ê Adarê hat dagîrkirin. Di encama dagîrkirina Efrînê de, zêdetir ji hezar welatiyên Efrînê şehîd û birîndar bûn, dora ji 300 hezar welatî jî bi neçarî derbider bûn. Ji wê demê ve jî, tawan û binpêkirinên mirovî li dijî welatiyên Efrînê bi awayekî rojane tên kirin.Sê sal di ser dagîrkitrina herêm û bajarê Efrînê re derbas dibin û bi awayekî rojane revandin, eşkencedan, kuştin welatiyan ji aliyê grûpên çekdar ve tên kirin û bi awayekî sîstematîk, mal û malên xelkê tên dizîn, talan û desteserkirin û bi armanca guhartina demografiya Efrînê û nehîştina nasnameya kurdbûna Efrînê, bi sedhezaran erebên Sûrî li şûna kurdan tên bicihkirin. Ji encama êrîşa Tirkiyê li ser Efrînê di 20ê Çileya 2018an de, Dora 300 sivîl şehîd bûn û 1500 sivîl birîndar bûn ku piraniya wan zarok û jin bûn. Dora 300 hezar kes derbider û koçber bûn.Bi armanca xelkê Efrînê bi neçarî koçber bibe û standina fidyeyê ji xelkê, ji dema dagîrkirina Efrînê ve, zêdetir ji 7 hezar welatiyên Efrînê ji aliyê grûpên çekdar ve hatine revandin û ta niha çarenivîsa nêzîkî 1 hezar kesî ne diyar e. Bi mebesta guhartina demografiya Efrînê, bi hezaran Erebên Xûtaya Şamê, parêzgeha Idlibê û navçeyên cuda ên Sûriyê li Efrînê di mal û milkên Kurdan de tên bicihkirin.**

**Her di wê derbarê de, rêjeya kurdan li Efrîn berî sala 2011, %97 bû, lê piştî dagîrkirina Efrînê di Adara 2018an de, rêjeya kurdan li Efrînê bû %35. Hejmara Kurdan niha li seranserî herêma Efrînê (300) hezar kesan in, lê hejmara Erebên lê hatine bicihkirin gihîştiye (460) hezar kesî. Ji bo têkdana nasname û kurdbûna Efrînê, zêdetir ji 45 cihên dîrokê, mezargehên olî û şûnwar hatine kolandin, dizîn û talankirin û firotan. Ji nava wan 15 mezar û cihên pîroz ên Êzidiyan e. ligel wê jî zêdetir 350 gorên Êzidiyan hatine şikandin. Bi hinceta avakirina xalên leşkerî, vekirina riyan, avakirina komlegehên nişticihbûnê, grûpên çekdaran zêdetir ji 625 hezar darên zeytûnan birîne û zêdetir ji 700 hezar darên hiracî birîne û şewitandine. Ji dema ku pêla vegerê bo Efrînê dest pê kiriye, ta niha bi sedan malbatên Kurd vegeriyane ser mal û mulkên xwe û pişta xwe dana deverên derbideriyê.**

**Pêla vegerê ji cenja qurbanê dest pê kir, û ta roja îro derbiderên Efrînê di rêyên qaçax re xwe digihînin malên xwe.**

**Li gor zanyariyên ARK 160 malbat vegeriyan û rewşa xwe çareser kirine, ya herî dawiyê 13 malbat bi meşê û li ser lingan ji kampên Şehbayê vegeriyabû Efrînê. Welatiyên Efrînê di vê derbarê de nerînên xwe tînin ziman.**

**Hemo ku xelkê Efrînê ye û niha koçber e wiha li ser vê mijarê dibêje, vegera xelkê Efrînê ji bo deverên xwe gelekî giring e, û evê bi awayekî rêkpêk were kirin, nabe di nava ragihandinê de dengekî mezin li pey xwe ve bîne, bi nerîna min ez dixwazim xelk bê deng vegere deverên xwe û rê li ber helmeta bi erebkirinê bigre, da ku ti kes li malên Kurdan neyê bicihkirin, raste xelkê me zehmetiyan dibînin, lê vegera wan baştirîn çareseriye ji bo rêgirî li erebkirinê û desteserkirina mal û milkên Kurdan li Efrînê.**

**Salar jî li ser vê mijarê wiha dibêje, vegera xelkê Efrînê tiştekî baş e, lê ew rastî astengiyan têne, gelek grûp ligel Partiya Yekîtiya demokratîk PYD nahêle ew vegerin deverên xwe ji berk u sûdê ji wan dibînin, lewma divê rê li ber wan were vekirin û ew bi hesanî vegerin ser mal û milkên xwe .**





# Erkê Nivîskaran di pêşvebirina civakê de



Mahir Hesen

Bi roja mirov têne binçav kirin di zindanên fahîşeyek îro giraniya xwe bi kar tîne û di bin navê dozek nezelal de, ya ku min dixwest ez bi parve bikim da ku ez Gotara xwe a li ser xapînokên siyasî û sedema mezinbûna koletiyê û berdewamiya astengî û hirişandina civaka kurd.
Rêkûpêkên têne kirin ji bo serdestiya leşkerî û pergala wê ya îstîxbaratê da ku danasîn were sepandin. Belê, bes e ku meriv di nav girseyên berfireh de bi tirsandina ji desthilatdariyê û amûrên wê yên ewlehî û destwerdana wê ya eşkere di hemî warên jiyanê de,û ji sernavê wan ê zordar, ne yasayî. Ji ber vê yekê, jihevxistina civakê û bi gelek dîwaran hawirî me dorpêç kirin ye, ku ya yekem guhdarîkirin û şopandina veşartî bo xizmeta siyaseta wan û ya dawîn jî têkbirina keyfî ye. ew çandek dorfireh û rewşek rojane ya jiyanê ye.
Siyasta dirûşmeyên ewlekariyê yên ku têgîna tevgera leşkerî ji bo xizmeta civakê û parastina ewlehiya wê pêk were, bi hestên rayedaran re girîng tête dîtin û ji ber vê yekê li ser bingeha çekdarî tê danîn. ku di rêvebirin û rêveberiyê de lêvegereka wan a veşartî heye. Ev yek bêtir balê dikişîne - ger serlêdanên wê pir bin jî - horguliyên ku taybetmendî û taybetmendiyên ku piraniya ezmûnên mîlîtarîzmê bi dîroka xwe a pir zor re parve dikin, û her destnîşan dike: ku ji sînorên destûr û avahiya dadayê ya ji desthilatdariya wan pir wêdetir diçin. Ji bo binpêkirina eşkere ya maf û azadiyên giştî ku ji hêla van karûbarên ewlehiyê ve têne kirin, tê pejirandin. Karanîna çavkaniyên mirovî û aborî ji bo mebestên ewlehî û leşkerî. Belavkirina çekan di nav sivîlan de li derveyî kontrol û çavdêriya desthilatdariyê. Endamên civakê ji çanda kevnar e û ji kuştinê têr nabe a bi şer û pevçûnan bikaranîn û nîşandana hêzê, bi baweriyek qayîm di pêşengiya hêza xwe û girîngiya wê di parastinê de. karûbarên civakê bê rêkûpêk û bê kontrolkirina wê.
Heya Îro, em gelek tiştan dibînin ku me digihîne wê encamê ku PKK ji mêj ve li ser rêya mîlîtarîzmê ye û jê nayê xwar, û tiştek li ber çavê me tune ye ku ji me re bibe alîkar ku em hêviya rizgariyê nêzîkê leşkerkirina Civakê bikin, û paşî jî ketina ser xewna demokratîk, ji ber sedemên ku di serî de dîroka pkkê de diyar dike. Kevn û nû ji bo desteserkirina desthilatdariyê ye , û girtina ewlehiya a di bin jêr giraniya tirs û gefên tûj û tehl li kurdan de ye. Ew ji kesekî / a ku bi êş û azara gelên me re têkildar e û di hişmendiya wan de kûr û dûr çû ye. Û leşkeriya neçar li Kurdistana Sûrî, ya ku yekem çirûska wê di bin navê erkê xwe parastinê di hat nasîn.
Dema ku tê leşkerkirin civakek zilm diyar dibe, û dûr ji veguherîna demokratîk dibe , bi hebûna hêzên leşkerî ên di bin ramanên cihêreng de, û bê perwerdayî tevî ku bê çek bin jî, gefan li xelkê dikin. Fîlozofê fransî Montesquieu gotiye dema ku wî di pirtûka xweya navdar (Ruhê Qanûnan): (Ew ezmûnek herheyî ye yê ku hêz di destê wî de hebe ew êzêdegaviyan bike). Heger çek di nav lepê desthilatdariya tenê li berjewendiyê xwe dixebite, wê demê xwe bi rengek ne qanûnî jî ferz bike an di bin dabînkirina ewlehiyê, û yan jî di bin hewcedariya peydakirina zemînek ji bo azadiyê, tam li vir gotina wezîrê dadê yê berê yê Fransî Robert Badintar tê bala mirov: (Ger desthilatdariya siyasî azad be mirov aza nîn in), ji ber ku azadiya giştî bêyî hebûna çend şert û mercên siyasî û civakî pêk nayên, pêk nayên û temam dibin.
Pêwîst e ku xwendevan , rewşenbîr, nivîskar serkêşiyê tevgera bike bo damezrandina ewlehî û pratîkên rastîn ên demokrasiyê, û pêşxistina wan di bin saziyên perwerdehiyê, û rê bidin saziyên civaka sivîl ku di wê de rolek sereke bilîzin. Ew nirxên pêşvebirina welat bi zanînê bidin, û hemberî yên ku dîktator û mîlîtarîzekirina civakê di xurtkirina wê de di zîhniyet û pratîka jiyanê de pêk aniye, rawestin û têne nifşek jîr bê çek ava bikin. Hemwelatiyên xwe bi xwendin bidin. Li gorî vê yekê, hewcedariya me bi nirxandinek berfireh û domdar heye, çavdêrîkirina wê û hewil bidin ku wê bi kûrahî bandor bikin, û ku çareseriyên li vir û wir pêk bînin, lê mixabin heya wek vê gavê jî rewşenbîr berevajî xwestî miletin, ne xwedî rengek girîng di rewşa siyasî de hene. Destpêkirina li ser ragihandin û medyayê bi gelemperî, bi zimanê partiyekê û bi raman ê wê diaxivin, û ji her tiştê ku dê mêjo û dîroka tijî bibîr bîne dûr dikevin, û nerîna wan neber bi mijarên zanistî û mirovî ve diherikin. danasîna belavkirina çanda konseya zilmdar, pêşxistina saziyên wê di nav civaka sivîl de, û dijî mirovahiyê li ser bingeha rêzgirtina ji dagîrkeran helwesta xweya xwezayî digirin.
Peyvek di dawiyê de pêdivî ye, ku rewşenbîr di pirtûkan de dîrokê û şopên wê bi giyanek dilnizm û piştrast ji nifşê pê re bidine diyar kirin. Belê rewşa hêzê demkurt e û xirabiya wê berbelav e, ji ber ku dilsozî bi tirsê nayê, û ew aramî dê tenê ji ramanê mirovên aza çêbibe. Tirsa ji bo xizmetkaran wê tenê zirarê bide xwediyê wê, û ji bilî bilindkirina dengê rastî û dadperweriyê li ser her dengekî.



## Ala Kurdistan



Emel Hesen

Ala Rengîn xwe dibîn e
Çulo û Çiya xwe dihejîn e
Kesk , Sor, Spî , Roj e
Zer netewe soz û Tav e
Ala Arîn xwe li bake
Têrîja xwe tû belavke
Sorgula sor tû silavke
Nav Cîhanê xwe bûhake
Ala Zêrîn Zer û Zîn e
Bûka Kurda qelen Xwîn e
Kelha jînê mest û Vîn e
Mem Pêşmergê dil Evín e
Ala Partî û Partîzan e
Jê tê bêhna Parewan e
Xweş Xelate li Welat e
Diyariya Mahabad e
Ala bedew hêvî û Jîn e
Vejîna Çiya ye Şêrîn e
Şoreşa Eylûl û Gulan e
Nav û dengê te Barzan e
Ala Meydya û Mîtan e
Peymana Qazî û Berzan e
Li Hewlêrê Qehreman e
Agirê dilê Şoreşan e
Berz û bilind Ala
Kurdistan e
Gel dildarê bejna Ciwan e
(16 )Şazdê Tebax
Navnîşan e